şopdara rastiyê ye
Ronahî
Hejmar :473 www.ronahi.net/ku/ 22- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



# Fermandar Çîçek bi çîrokên şer mezin bû

Gerîla bi jiyan û çalakiya xwe, bi gotin û nivîsa xwe dîrokê dinivîsîne. Rojnivîskên gerîla jî encameke vê yekê ne.
Em beşek ji rojnivîskên gerîlayên şehîd bûne parve dikin. Hinekan qala dema naskirina Tevgera Azadiyê ya Kurd kirine, hinekan dilsoziya xwe ya bi erdnîgariya xwe re nivîsîne, hinekan behsa dîtina Rêber Ocalan û dilsoziya bi têkoşîna azadiyê re kirine. Rojnivîsk ji wan re bûye hemsir. Pê zanin ku ew xwedî nasnameyeke mezin a kolektîf in, zanin ku ew siwarên hêviya gelê mezlûm ê 50 milyonî ne, baş zanin ku serketin û têkçûn wê di hişê civakê de rê li ber kîjan encamê vekin. Ne tenê zanin, her wiha fêhm dikin û cîhana xwe ya fêhmkirin û watedayinê mezin dikin. Hewl didin hêjayî welat, gel û partiyê bin.

## KOÇERA BOTANÊ



Em bi rojnivîska Şehîd Çîçek Kiçî dest bi rêzenivîsa xwe dikin. Endama Konseya Leşkerî ya HPG'ê Çîçek Kiçî / Çîçek Botan (Guhar Çagirga), 10'ê Cotmeha 2011'an ji ber êrîşa hewayî tevî 6 hevalên xwe şehîd bû. Çîroka jiyana wê Mîna nimûneya şerê 40 salî yê gelê Kurd ê li dijî mêtingeriya Tirk e. Çîçek sala 1975'an li gundikê Kavirkir ê gundê Cinibre yê Cizîrê ji dayik bû. Keça eşîreke koçer bû. Çîçek bi çîrokên şer mezin bû ku gava mezinên wê li binê konan li hev diciviyan û qalê dikirin, wê guh dida wan. Çîçek, sala 1989'an li Zozanên Çemê Kare yê navçeya Berwarî ya Sêrtê tevlî nava refên PKK'ê bû.

## BÛ YEKEMÎN GERÎLAYA JIN A EŞÎRÊ

Bû jina yekemîn ku ji eşîra Kiçanê tevlî nava refên PKK'ê bû. Biryara Çîçek a ji bo tevlîbûna li nava refên PKK'ê di nava malbata kesê pê re hate zewicandin û eşîrê de rê li ber pirsgirêkê vekir. Li Zozanên Çemê Kare di civîneke endamên eşîrê de Çîçek bi van gotinan biryara xwe ya tevlîbûnê eşkere dike: "Ez ji ber ti pirsgirêkê tevlî nabim. Tenê armanceke min heye. Weke miroveke Kurd ez jî dixwazim tevlî nava partiyê bibim û ji bo welatê xwe şer bikim."

## VEGOTINA LI GORÎ RASTIYÊ

Çîçek Kiçî di rojnivîska xwe de dibêje ku wê li gorî rastiyê qala kêliya destpêkê ya ku Ocalan nas kir bike û diyar dike ku ev yek ji bo kadroyên Rêbertî wezîfeyek e. Lê berî qala vê bike, behsa dema naskirina PKK'ê dike. Em ji rojnivîska wê dewam bikin: "Di emrê zarokatiyê de min partî nas kir. Sala 1983 bû. Partî wê wextê weke APOCÎ û Telebe dihate naskirin. Mîna li her cihî, li devera ku lê ji dayik bûm û mezin bûm, hevalan karê partiyê dikirin. Wê demê hevalên Fîraz û Sabrî Ok li aliyê me dixebitîn. Gelek heval niha şehîd bûne. Bi rêya van hevalan min partî nas kir û tevlî bûm."
Kiçî dema ku tê welêt, emrê wê hîn biçûk e. Bi giranî li herêma Botanê dimîne. Ocalan sala 1993'an dixwaze ji bo perwerdeyê komek were şandin. Di rojnivîskê de wiha tê gotin: "Dema ku hevalên li qadê navê endamên komê diyar dikirin, ez gelekî kelecanî bûm. Min dixwest min jî bişînin, lê min dikir nedikir nikarîbûm vê daxwaza xwe bêjim.
DESTPÊKÊ JI BO HEVRÊYÊN XWE
Ji ber ku di nava PKK'ê de mirov tiştên herî baş destpêkê ji bo hevrêyên xwe dixwaze û xwe pêşniyar nake. Ji ber ku mijar dîtina Rêbertî bû, ez gelekî bi coş û kelecanî bûm û ji bo xwe pêşniyar neke min gelekî zor dida xwe. Mîna hevrêyên din, xeyala min a herî mezin dîtina Rêber Apo bû. Lê ji aliyê exlaqî ve min rast nedidît ku vê pêşniyarê bikim.

## MAL Û MILKÊ DINYAYÊ BÛBÛN YÊN MIN

Dema ku nav dihatin eşkerekirin, hîn bi kelecanî dibûm. Û gava min navê xwe bihîst, mîna ku her tiştê dinyayê bûbû yên min. Piraniya hevalan ji bo perwerdeyê ez pêşniyar kiribûn û pêşniyara wan hatibû qebûlkirin.
Piştî demekê em derbasî Sûriyeyê bûn û heval hatin pêşiya me. Li dû çend rojan hevalan ji me re gotin ku Rêbertî hatiye. Min texmîn nedikir ku Rêbertî ewqasî zû bibînim. Heval hatin cem me û gotin ku Rêbertî li benda me ye. Gelekî kelecanî bûbûm û min hîn bawer nedikir Mîna ku di nava xewnekê de bûm.

## RÊBER APO LI PÊŞBERÎ MIN BÛ

Em hîn nû ji çiyê daketibûn, me kincê xwe guhertibûn û hevalên nû nas kiribûn. Min texmîn nedikir ku xewn û xeyala min wê di demeke ewqasî zû de pêk were. Ji nişka ve dema min li derî nihêrî min Rêber Apo li pêşberî xwe dît. Bi dorê yek bi yek silav da hevalên ku ketibûn rêzê.

## EZ BEZIYAM Û MIN EW HEMBÊZ KIR

Ez yekser ketim serê rêzê û ber bi Rêbertî ve beziyam. Hemû heval bi rengekî matmayî li min dinihêrîn. Min xwe gihand Rêbertî û ew hembêz kir. Min nedixwest qet dev ji wî berdim. Ew kêlî baş nayê bîra min, lê bawerim min qet nedixwest dev ji Rêbertî berdim. Min ne bawer bûm ku ew kêlî ji bo min xeyal bû ya jî rastî bû. Bi destan min xwe hinekî hejand û fêhm kir ku ew kêlî ne xeyal e, lê rastî ye.
Rêbertî jî min hembêz kir û got, 'Temam, temam kelecanî qediya'. Bawerim Rêbertî wê kêliyê bi kelecaniya min hesiyabû. Ji xwe bi rûyê li ken ji min re got, 'Temam, temam kelecan nema. Tu êdî li cem Rêbertî ye'. Yek bi yek silav da hemû hevalan û ew hembêz kir.
HEVAL TU BIÇE DIBISTANA KURDÎ
Dema xwarinê bû, hevalan sifre amade kiribûn. Ji bo xwarinê em li benda hatina Rêbertî bûn. Wê wextê min xwe nêzî hevalekî kir û jê pirsî 'Rêbertî li ku rûdinê?'. Heval jî şûna wî rê min da. Ez jî yekser çûm cem wê kursiyê û min kursiya xwe danî kêleka ya Rêbertî. Piştî ku Rêbertî hat, me dest bi xwarinê kir. Dûre Rêbertî got, 'Du dibistanên me hene. Yek bi Tirkî ye, yek jî bi Kurdî. Em ê hevalan li gorî vê yekê bi cih bikin.' Li min vegeriya û got, 'Heval tu biçe dibistana Kurdî'.

## PIŞTÎ DU ROJAN HAT CEM ME

Du roj piştî ku çûm dibistana Kurdî hevalan gotin, 'Rêbertî wê îro were û bi we re nîqaş bike'. Hejmara me zêde bû. Hinek heval ji Rûsyayê, hinek ji Bakur, hinek jî ji Başûr hatibûn. Yanî koma me rengîn bû. Hinek heval jî ji Ewropayê hatibûn. Em pênc, şeş heval jî ji welêt hatibûn. Me dît ku Rêbertî li ber derî li benda me ye. Li gorî hevdîtina destpêkê ez hîn xwegir bûm. Li benda dora xwe mam. Dema ku dora min hat çûm cem Rêbertî.
Rêbertî ji min re got, 'tu hîn sakîn bûye', min jî got, 'rast e Serokê min'. Ya rast hîn jî gelekî kelecanî bûm. Dibe ku pênaseyeke ne tam rast be, lê belê; çawa ku zarokek ji dê-bavê xwe hez dike û bi hesreta wan e, hestê min jî bi wî rengî bû. Bawerim ev hest bi her hevalên çûn qada Serokatî re hebû. Teqez her hevalê/î gotiye, 'Rêbertî di nava ewqas hevalan re herî zêde bi min re eleqedar e, mirovê ku li dinyayê herî zêde jê hez dike ez im'. Lê belê rastî ne bi vî şeklî bû.
TIMÎ MIROV ONÛRE DIKIR
Hestên me hestên 'Rastiya Rêbertî' bûn. Ji ber ku Rêbertî qîmet dida hemû mirovan, her mirovek onûre dikir. Lewma ev hest bi her kesî re hebû.

## TU ÇIMA EWQASÎ ZÛ TEVLÎ BÛ?

Piştre hevalan çay ji me re anîn. Yek bi yek bi hevalan re axivî û gotûbêj kir. Ji her hevalê/î re pirsên 'Tu kî ye, ji ku ye, çawa tevlî bû? dikir. Min jî hewl dida gotinên herî xweş û bedew bineqînim û bilêv bikim. Ji xwe berê ji ber kelecanê min xwarin bi ser xwe ve rijandibû û gelekî fedî kiribû. Dema ku Rêbertî hat cem min, min xwe rast kir û bi vî rengî li pêşberî wî sekinîm. Hat û got, 'Tu hevala Çîçek e ne welê?' û ji min pirsî bê kî me, ji ku me, çawa tevlî bûme. Gava ku min dema tevlîbûna xwe got, pirsê bê ez li gorî qanûna leşkerî tevlî bûme yan na. Dema ku min jê re got ku li gorî qanûna leşkerî tevlî nebûme, matmayî ma û got, 'emrê te gelekî biçûk e, tu çima ewqasî zû tevlî bû'. Min jî jê re got ku hevalên kevn ên hatin cem me bandor li min kir û ji ber welatparêziya malbata min tevlî bûm.

## RAPOR BERIYA MIN GIHAŞTINE

Berî bêm qada Rêbertî , hin hevalan di raporên xwe de qala min kiribûn û pêşniyar kiribûn ku li qada Rêbertî perwerdeyê bibînim. Haya min ji van rapor û pêşniyara tine bû. Rêbertî ji min re qala vê rewşê kir. Got, Di hin raporan de navê te heye, hevalan pêşniyar kirine. Gelo ew hevala Çîçek tu ye?' Dema ku ev pirs li min kir, ez matmayî mam. Ji ber ku haya min ji pêşniyareke wiha tine bû. Lewma min nizanîbû ku çi jê re bêjim...*ANF*

şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 473 22- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li Efrînê 6 dagirkerên Tirk hatin kuştin



Çalakiyên şervanên YPG û şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê li Efrînê li dijî dagirkeran dewam dikin. Di çalakiyeke şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê de li taxa Turindê ya Efrînê 4 çeteyên dewleta Tirk a dagirker hatin kuştin. Hêzên YPG'ê jî li navçeya Bilbilê ya Efrînê li baregeha çeteyên Ehrar el Şerqiyê xistin. Di çalakiyê de 2 çete hatin kuştin.*R-2*

# AQÛBETA 835 SIVÎLAN NAYÊ ZANIN



**Dewleta Tirk zêdeyî 7 mehe bajarê Efrînê dagirkiriye. Dewleta dagirker bi alîkariya çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagir kir yekser dest bi paqijiya etnîkî, guhertina demografîk, talan, revandin, êşkence û kuştinê kir. Van kiryarên xwe roj bi roj zêde dike.**


## 2 HEZAR 350 SIVÎL REVANDINE

Dewleta Tirk tevî çeteyên xwe li Efrînê li pêş çavên cîhanê sûcê mirovahiyê dike. Lê li hember van kiryarên di mirovahî yên dewleta Tirk cîhan bêdeng e. Hat ragihandin ku ji destpêka dagirkirina Efrînê û heta niha dagirkeran 2 hezar 350 sivîl revandine, ji wan 139 jin in. Hat gotin ku aqûbeta 835 sivîlan jî ne diyar e.

## XWEZA Û DARÊN ZEYTÛNÊ TUNE DIKIN

Ji aliyê din ve dewleta Tirk û çeteyên wê xweza û deverên dîrokî yên herêmê jî tune dikin. Hat ragihandin ku dagirkeran heta niha zêdetirî 5 hezar hektar daristan şewitandine û dest danîne li ser zêdetirî 4 hezar û 500 darên zeytûnê. Dîsa dagirkerên Tirk dest danîne ser bi qasî ji sedî 90 zeytûnên welatiyan.*R-5*

## DAIŞ'ê ew dîl girtîbû bû niha endama Meclîsa PADÊ ye



Li Şengalê jin roj bi roj beşdarî xebatên xwe birêxistinkirinê dibin. Jina ciwan a bi navê Xemê Berekat Xwedêda ya ku ji destê çeteyên DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin, bû endama Meclîsa Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ). Xemê Berekat bang li jinên Êzidî kir ku ji bo careke din ferman neyên serê wan tevlî nava xebatên xwe bi rêxistinkirinê bibin.*R-3*

## QSD'ê nifşek ji paşverûtiya DAIŞ'ê rizgar kir

Pîrozbahiyên yekemîn salvegera rizgarkirina Reqayê dewam dikin. Buroya MSD'ê ya Helebê bi boneya yekemîn salvegera rizgarkirina Reqayê li taxa Şêxmeqsûd bi beşdariya bi dehan welatî û endamên saziyan civînek lidarxist. Di civînê de qala girîngiya rizgarkirina bajêr hat kirin û hat gotin ku QSD'ê bi rizgarkirina Reqayê nifşek ji fikrên paşverû yên DAIŞ'ê rizgarkir.*R-5*




## Ji bo pergaleke hevpar a zanîngehan gaveke dîrokî hat avêtin

Encamnameya 1. Konferansa Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku rojên 19 û 20'ê Cotmeha li bajarê Qamişlo hat lidarxistin hate eşkerekirin. Di encamnameyê de bal hat kişandin li ser tecrubeyên ku bi şoreşê re derketine û hat gotin ku ji bo pergaleke hevpar a zanîngeh û akademiyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gaveke dîrokî hate avêtin.*R-7*

## Partiyên siyasî yên Kurd li Amedê li hev rûniştin

Piştî komxebata Rêveberiyên Xwecih a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) hilbijartin hate despêkirin. Piştî komxebatê li ser vexwendina Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî bi partiyên Kurd re hatin cem hev. Hate gotin li ser helwesta hevpar a li dijî gefên Erdogan hatiye axaftin.*R-4*



## Kurd yekîtiya xwe ava nekin wê dîsa winda bikin



Bi pêşengtiya Kongreya Netewî ya Kurdistan ji bo gutûbêjkirina rewaşa Kurdistan û çareseriya pirsgirêka Kurd bi tevlîbûna hejmarek siyasetmedar û rewşenbîrên çar parçeyên Kurdistanê li bajarê Dihokê civînek hat li dar xistin. Di civînê de hat gotin ku divê Kurd yekîtiya xwe ava bikin û bang li PDK'ê jî hat kirin ku li pêş yekîtiya Kurdan nebe asteng.*R-4*

## Em Sûriyeke demokratîk û pirrengî dixwazin




Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Îbrahîm Qeftan li Minbicê beşdarî civînekê bû diyar kir ku Rûsya û Rêjîma Sûriyê dizanin ku çarenûsa terorîstên li Îdlibê di destê Tirkiyê de ye. Qeftan wiha got, "dema xaka Sûriyê ji dagirkeriya Tirk were rizgarkirin wê danûstandin û çareseriya aloziya Sûriyê pêk were."*R-4*

# Hêvî û baweriya wan a vegera Efrînê mezin e

**Welatiyên Efrînê ev bû 7 mehe li Şehbayê bi hêviya vegera Efrînê li ber xwe didin. Tevî ku şert û mercên jiyana wan zehmet e jî lê dev ji tekoşîn û rêxistinkirina xwe bernadin. Welatiyên Efrînê yên ku li Şehbayê bi cih bûne diyar kirin ku hevî û baweriya wan gelek mezin û ew ê rojekê vegerin warê xwe Efrînê.**

Gelê Efrînê yê ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê neçar ma ku dev ji warê xwe berde û li Şehbayê bi cih bibie, hêviya wan a vegera warê wan mezin e.

Bi sed hezaran welatiyên Efrînê ev 7 meh e ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagirker li herêma Şebayê bi cih bûne. Gelê Efrînê bi her awayî li Şehbayê li ber xwe dide.

Welatiyên Efrînê li Şehbayê tevî zehmetiyan jî jiyana xwe bi rêxistin dikin. Welatiyên Efrînê navên ku wateya vegera li Efrînê didin, li dikanên xwe dikin.

Mihemed Mihemed ji ber ku baweriya wî bi vegera li Efrînê heye, navê El-Ewda (Veger) li xwaringeha xwe kiriye. Mihemed destnîşan kir ku ev 7 meh e li Herêma Şehbayê li ber xwe didin û anî ziman ku wê li Efrîna berxwedêr vegerin.

Reşîd Iço destnîşan kir ku ew li Şehbayê bi cih bûne, jiyana xwe li wê derê bi rêxistin kiriye, ji xwe re dikanên bazirganiyê vekirine da ku pê debara jiyana xwe bikin. Reşîd Iço diyar kir ku wê li Efrînê vegerin û dikanên xwe bi heman navî li warê zeytûnan vekin.

Mihemed Hebeş jî diyar kir ku ew li herêma Şehbayê zehmetiyan dibînin, çavên wan her tim li rêya vegerê ye û wî jî navê Racîn (Em ê vegerin) li xwaringeha xwe kiriye, ji ber ku baweriya wî heye ku wê li warê xwe vegerin.

Luqman Reşîd diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê mal û milkên wan talan dikin. Reşîd diyar kir ku wî ji ber kiryar û hovîtiya dagirkeran berê xwe da herêma Şehbayê û navê "Efrînê em ê vegerin" li dikana xwe kiriye…*ANHA*




## *Zarokên Eyn Îsa bi zimanê xwe perwerdê dibînin*



Xwendekarên navçeya Eyn Îsa bi zimanê xwe yê dayîkê perwerde dibin û ji bo materyalên Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) kêfxweşiya xwe anîn ziman.

Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya navçeya Eyn Îsa, di sala perwerdeyê ya duyem de piştî ku navçe hat rizgarkirin, dibistan vekirin.

Pêkanîna rêgeza demokrasiyê û jiyana hevbeş di navbera hemû pêkhateyên gelê Sûriyê de, di materyalên ku Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk amade kirine de, esas hatin girtin. Bi rêya van materyalan her pêkhateyek dikare bi zimanê xwe bixwîne.

Li dibistanên navçeya Eyn Îsa her du pêkhateyên navçeyê yên Ereb û Kurd di 4 salên destpêkê yên perwerdeyê ango ji refê yekê heta refê 4`an de her pêkhateyek bi zimanê xwe dixwîne. Piştre, xwendekarên Ereb wekî madeyekê zimanê kurdî fêr dibin û xwendekarên kurd jî wekî madeyekê zimanê Erebî dixwînin.

Têkildarî mijarê her du şagirtên bi navên Nehle Hemê û Rohilat Mihyedîn ên ji pêkhateya Kurd destnîşan kirin ku perwerdeya bi zimanê Kurdî mafekî xwezayî ye lê ew bi dehan salin ji mafî bêpar hatibûn hiştin.

Girêdayî heman mijarê şagirtên bi navên Mahir Mehmûd û Elî Hisên ên ji pêkhateya Ereb diyar kirin ku fêrbûna zimanê Kurdî li gel xwendina bi zimanê xwe Erebî danûstandin û fêhmkirina di navbera her du pêkhateyan de hêsan dike.

Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya navçeyê derdora 150 dibistanên navîn û seretayî sererastkirin û 15'ê Îlonê vekirin. Li gorî serjimariyên komîteyê nêzî 15 hezar şagirt diçin dibistanê…*ANHA*

## Dema çandiniyê destpê kir, pêdivî bi mazotê heye

Mewsima çandiniyê li navçeya Şedadê di nav gelek astengiyan de dest pê kir. Ji aliyekî din ve ruxset ji zêdetirî 550 bîrên navçeyê re hatine dayîn.

Piştî ku mewsima çandiniyê ya navçeya Şedadê ya kantona Hesekê ji ber kêmbarîna baranê di sala borî de gelek ziyan dît, cotkarên navçeya Şedadê amadekariyên mewsima çandiniyê yên sala nû dikin.

Cotkarên gundewarên Şedadê diyar kirin ku di nav gelek kêmasiyan de, mewsimê dest pê kiriye. Her wiha cotkaran diyar kir astengiya herî mezin ku ew dibînin nebûna mazotê ye. Ji ber ku cotkar bêyî jenerator nikarin avê ji bîran derxin.

Cotkaran destnîşan kirin ku di encama serweriya ewlehî û aramiyê li herêmê, piştî têkbirina DAIŞ'ê, welatî zeviyên xwe diçînin.

Têkildarî mijarê hevserokê Saziya Avê ya Şedadê Fadil Ehmed axivî û diyar kir ku zêdetirî 15 hezar hektar zevî ku bi rêya bîran tên avdan, li navçeyê hene. Her wiha bi hezaran hektar zeviyên be jî li ser her du beravên Xabûr ên rojhilat û rojava hene.

Ehmed diyar kir ku erka wan a sereke di dema niha de, dayîna ruxsetên bîran e. Heta niha ruxsetên zêdetirî 550 bîran dane. Ehmed destnîşan kir ku çemê Xabûr, damara sereke ya çandiniyê li bajarê Şedadê ye û wiha dewam kir: "Lê ji ber şerê ku li herêmê rû dane û girtina dewleta Tirk a çem, bû sedema daketina rêjeya avê li bendava Hesekê. Vê jî bi xwe re pirsgirêk zêde kirin."

Ehemd da zanîn ku ji bo misogerkirina mewsimeke baş, bi Gerînendetiya Avê ya Hesekê re nîqaş kirine. Li ser wan nîqaşan ava bendavê wê 3 caran ji cotkaran re di mewsima çandiniyê de bê vekirin. Cara yekemîn 15'ê meha bê de wê av bê berdan.

Di dawiyê de hevserokê Saziya Avê Fadil Ehmed soz da ku pirsgirêkên cotkaran di zûtirîn demê de çareser bikin…*ANHA*



## Rêveberiya kampê ji bo koçberan derfetên kar ava dike



Bi rêya nivîsgeha karkirinê derdora ji sedî 90 koçberên Eyn Îsa derfetên kar di nav kampê de dîtine.

Li kampa Eyn Îsa 13 hezar koçber hene. Rêveberiya Kampa Eyn Îsa ji rêxistinên karkeran ên li kampê re dibe alîkar û derfetên kar ji koçberan re dibîne.

Buroya karkirinê ji koçberên kevn re ku hatine kampê û navên xwe tomar kirine, derfetên kar peyda dike. Buro ji rêxistinên perwerdeyê re dibe hevkar ku kesên xwedî bawername, wek mamoste û berpirs û gelek karên din bidin xebitandin. Buro hewl dide mehane ji 200 heta 300 koçberan di hundirê kampê de wek karkerên paqijiyê bide xebitandin.

Derbarê mijarê de, koçberê bi navê Adil El-Hemûda spasiya rêveberî û nivîsgeha karkirinê kir ku derfetên kar ji wî re dîtin.

Endamê rêveberiya kampê Celal El-Eyaf destnîşan kir ku buroyê derfetên kar ji bo ji sedî 90 kesên ku dixwestin kar bikin, dîtin.

El-Eyaf diyar kir ji ber ku rêxistinên alîkariyê rewşa wan a madî paşguh kirine hêjmareke mezin ji koçberan rojane derdikevin navçeya Eyn Îsa da ku bixebitin…
*ANHA*



# Di mihrîcanê de rengên jinên Kobanê

**Di 20'ê Cotmehê de li bajarê Kobanê yekemîn care ku 4`mîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Dîcle-Firat a Şehîd Hogir hate lidarxistin. Di mihrîcanê de ya herî balkêş ew bû jinên Kobanê bi cil û bergên xwe yên gelêrî û bi çêkirina xwarinên herêmî beşdarî mihrîcanê bûn.**



Jinên Kobanê bi cil û bergên xwe û bi xwarinên xwe yên gelêrî rengek cuda dane Mihrîcana 4`emîn a Dicle-Firatê ya Şehîd Hogir.

Di 20'ê Cotmehê de li bajarê Kobanê yekemîn care ku 4`mîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Dîcle-Firat a Şehîd Hogir hate lidarxistin. Festîval bi beşdarbûna gelên herêma Firatê, Minbic, Reqa û Tebqayê hate lidarxistin. Her pêkhateyekê bi çanda xwe tevlê festîvalê bû û rengek cuda da festîvalê.

Lê ya herî balkêş di ew ku jinên Kurd yên Kobanî bi cil û bergehên xwe yên gelêrî beşdarî mihrîcanê bûn. Her wiha jinên Kobanê xwarinên Kobanê yên gelêrî wekî "çîkê sar, çîkê goşt, tirşika holikan, şilik, nanê tîrê û hwd, di mihrîcanê de amade kirin û pêşkêş kirin.

Dayîka Edûl Silêman ku xwarina gelêrî tirşika holikan amedekirbû got: "Em gelekî kêfxweş in bi vê gavê ku em jin bi cil û bergên xwe û bi xwarinên xwe yê gelêrî tevlî festîvalê bûn. Bi gavên bi vî rengî em ê çanda xwe ya resen zindî bihêlin."

Her wiha Ceylan Şehîn ku şorba dew çêkiriye kêfxweşiya xwe anî ziman û diyar kir ku ev roj ji bo wan rojeke taybet e, ji ber ew bi çanda xwe ve girêdayî ne…*ANHA*

## Divê jin bibin yek û dengên xwe bilind bikin





Endamên Mala Jinê û Saziya Malbatên Şehîdan bertek nîşanî qetilkirina jinan dan û diyar kirin ku divê kesên jinan qetil dikin û îstîsmar dikin werin darizandin û gotin: "Divê bêdengiya cîhanê ya derbarê qetilkirin û îstismarkirina jinan bi dawî bibe û kesên ku komkujî û îstismarê dikin bên darizandin."

Li cîhanê her ku diçê komkujî û îstismara li dijî jinê zêde dibe. Kesên ku jinan dikujin, tecawiz û istismarê li dijî wan pêk tînin nayên darizandin. Têkildarî mijarê de Endamên Mala Jinê û Saziya Malbatên Şehîdan yên Til Temir dan zanîn ku ji bo komkujî, şiddet, taciz, tecawiz û îstismara li dijî jinê bi dawî bibe dengekî hevpar lazim e û wiha gotin: "Divê rê li ber kuştin, tecawiz, şiddet, taciz û istîsmara li dijî jinê bê girtin. Ev bûyer her ku zêde dibin civakê ber bi xetereyek mezin de dibe."

Endama Mala Jinê Şemsa Şêxmûs da zanîn ku ji ber kujer nayên cezakirin û darizandin kuştin, tecawiz, şiddet, taciz û îstismar zêde dibe û wiha got: "Kesên ku jinê qetil dikin jiyanê jî qetil dikin. Qetilkirina jinê pirsgirêkên civakî kûrtir dike. Dema ku jin tên kuştin hemû nirxên civakî binpê dibin. Ji bo jiyanek aram divê pêşî li kuştin, tecawiz, şiddet û tacîzê bê girtin. Divê li dijî vê yekê hemû jin bibin yek dakevin qadan û mafên xwe biparêzin.Divê bêdengiya cîhanê ya derbarê qetilkirin û îstismarkirina jinan de bi dawî bibe û kesên ku komkujî û îstismarê dikin bi cezayên mezin bên darizandin."

Hevseroka Meclîsa Saziya Malbatên Şehîdan Henîfa Silêman jî diyar kir ku divê li dijî kuştin, taciz, tecawiz, îstismarê dengekî hevpar ê navneteweyî bilind bibe û wiha got: "Dema dengekî navneteweyî bilind nebe wê pêşî li kuştin, taciz, tecawiz û îstismarê neyê birrîn. Ji aliyekî din ve jî bêdengiya navneteweyî erêkirina qetilkirina jinê ye. Divê hemû jin bibin yek û dengên xwe bilind bikin. Heta ku êrîş û şîdeta li dijî jinê bi dawî nebe ew ê pirgirêkê civakê jî mezintir bibe."…*JINNEWS*

## DAIŞ'ê ew dîl girtîbû bû niha endama Meclîsa PADÊ ye




Jina ciwan a bi navê Xemê Berekat Xwedêda ya ku ji destê çeteyên DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin, bû endama Meclîsa Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ).

Roj bi roj keç û jinên Êzidî ji bo xwe bi rêxistin bikin beşdarî karên siyasî dibin. Di 20'ê Comtehê de 2. Kongreya Partiya Azadî û Demokrasiya Êzidiyan (PADÊ) bi beşdarbûna 300 delegeyan pêk hat. Di kongreyê de Jina ciwan a bi navê Xemê Berekat Xwedêda ya ku DAIŞ'ê dîl girtibû û piştre hat rizgarkirin, bi 90 dengan bû endama Meclîsa PADÊ'yê.

Xemê Berekat Xwedêda 3 salan di destê çeteyên DAIŞ'ê de ma, piştre ji aliyê hêzên YBŞ û YJŞ'ê ve hate rizgarkirin. Piştî ku rizgar bû, biryar da ku beşdarî nava xebatên PADÊ bibe. Di 2. kongreya PADÊ de bû endama Meclîsa Rêveberiya PADÊ.

Xemê Berekat Xwedêda di derbarê beşdarbûna xwe ya di nava siyasetê de axivî û got, "Di dema ez ketim destê çeteyan de yên ku herî zêde bi rizgarkirina me ve elaqedar bû, heval û ev rêxistin bû. Ji bo vê jî min wek keçeke ku rastî hemû cûreyên zehmetiyan hatî, ji bo ku ez karibim ji bo keç û jinên Êzidiyan xizmetê bikim min biryar da tevlî nava kar û xebatên PADÊ bibim. Ji ber yê zehmetî dîtîye zêdetir dikare xizmetê bike."

Xemê Berekat bang li jinên Êzidî kir ku tevlî nava her cûre xebatan bibin û got; "Ji bo em karibin tola dayik û xwîşkên xwe hilînin bang li hemû jinan dikim ku beşdarî xebatê bibin. Her kes dizana yên herî zêde rastî zehmetiyan hatî keç û jinên Êzidî bûn. Lewma divê jinên Êzidî ji bo carek din rastî van zehmetiyan neyên li ber xwe bidin û tevlî nav siyasetê bibin. Ger em bi rêxistinkirî bûna, wê ew karesata di sala 2014'an bi serê me nehata."…
*ROJNEWS*

## JINWAR warê hemû jinan e




Malbatên ku li Gundê Jinê JINWAR'ê yê Bajarê Dirbêsiyê, bi cih bûne diyar kirin ku jiyanek bi rûmet û wekhev li JINWAR'ê heye û gotin: "JINWAR warê hemû jina ye, hemû jinan hembêz dike."

Di 25'ê Mijdara 2016'an de kevirê yekemîn di avakirina Gundê Jinê JINWAR'ê de hat danîn û di 8'ê Adara 2017'an de dest bi avakirina malan hat kirin. JINWAR girêdayî bajarê Dirbêsiyê ye. Heta niha 30 mal lê hatiye avakirin û hîn projeya avakirina wê dewam dike. Di nav gund de dibistan, kafeterya, nexweşxane, akademî, hola ji bo lîstîna zarokan hatiye avakirin.

Gundê jinê JINWAR ku bi destên jinan tê avakirin, bi armanca hembêzkirina jin û zarokên berxwedêran, jinên rastî tundî û şidetê tên, tê avakirin. Li JINWAR'ê cudatiya netewan tune ye. Heta niha jê 2 malbatên Ereb 6 malbat li gund bi cih bûne. Malbat jiyanek xwezayî ya bi keda destên xwe dijîn. Têkildarî mijarê jinên li gund bi cih bûne nêrînên xwe anîn ziman.

### EM WEKHEV DIJÎN

Bedra Derwîş a ji pêkhateya Ereb û 35 salî ku ji gundê Silmas a bajarokê Şedadê ye got: "Hevjînê min berî 6 mehan di şerê li dijî DAÎŞ'ê di nav refên QSD'ê de şehîd ket. JINWAR'ê min û zarokên min hembêz kir. Ez dayika 7 zaroka me. Piştî hevjînê min şehîd ket ez û zarokên xwe bi alîkariya Saziya Malbatên Şehîdan me debara jiyana xwe dikir. Lê dîsa jî rewşa me ne zêde baş bû. Loma me berê xwe da gundê jinê. Dema em hatin JINWAR'ê jiyana me êdî hat guhertin. Em Kurd û Ereb li vir di nava jiyanek wekhev de dijîn."

### JIYANEK NÛ LI VIR HEYE

Zeyîneb Seberî ya ji bajarê Geverê ya Bakurê Kurdistanê ye wiha behsa çîroka jiyana xwe kir: "Di 15 saliya xwe de bavê min bi zorê ez zewicandim, piştî çend mehan hevjînê min bi nexweşiyekê jiyana xwe ji dest da, wê demê ez dûcanî bûm. Ji bo parastina kurê xwe bikim min berê xwe da Mexmûrê û li wir min kurê xwe xwedî kir û niha 10 salî ye. Dema min televizyon temeşa kir min fam kir ku gundê jinê JINWAR heye ku hemû jin tê de jiyanek wekhev û bi rûmet dijîn. Min jî berê xwe da Rojavayê Kurdistanê. Dema ez hatim JINWAR'ê min jiyanek nû ji xwe re ava kir. Li vir ez berpirsiyara baxçe me û her roj karê xwe dikim, kurê min jî diçe dibistanê."

### JINWAR WARÊ HEMÛ JINAN E

Emîra Muhemed a 33 salî û dayika 5 zaroka ye û li gundê Haçxlî yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê dijiya wiha got: "Hevjînê min ji ber nexweşiya dil jiyana xwe ji dest da. Piştre ez û zarokên xwe çûn mala bavê xwe. Rewşa me pir ne baş bû. Lê gundê aştiyê û wekheviyê JINWAR'ê min û zarokên min hembêz kir."

Emîrayê bal kişand ser jiyana gund a hevpar û got; "Li vir her jinek karekî dike, bi hev re em dijîn. Em wekî malbatekê ne. Ez jî berpirsiyara xwaringehê me û xwarinê ji hevalên xwe re çê dikim. Banga min ji tevahî jinên ku di nava zehmetiyê de dijîn ew e ku berê xwe bidin stargeha jinê JINWAR'ê da ku jiyanek azad, bi rûmet û bi nirx bijîn. JINWAR warê hemû jina ye, tevahî netewa hembêz dike."…*JINNEWS*

# Kurd yekîtiya xwe ava nekin wê dîsa winda bikin

**Bi pêşengtiya Kongreya Netewî ya Kurdistan ji bo gutûbêjkirina rewaşa Kurdistan û çareseriya pirsgirêka Kurd bi tevlîbûna hejmarek siyasetmedar û rewşenbîrên çar parçeyên Kurdistanê li bajarê Dihokê civînek hat li dar xistin. Di civînê de hat gotin ku divê Kurd yekîtiya xwe ava bikin û bang li PDK'ê jî hat kirin ku li pêş yekîtiya Kurdan nebe asteng.**



Li Dihokê nûnerê ji çar parçeyên Kurdistan bi pêşengtiya KNK'ê de li hev kom bûn û bal kişandin ser çareseriya pirsgirêka Kurd û yekîtiya Kongreya Neteweyî.
Bi pêşengtiya Kongreya Netewî ya Kurdistan ji bo gutûbêjkirina rewaşa Kurdistan û çareseriya pirsgirêka Kurd bi tevlîbûna hejmarek siyasetmedar û rewşenbîrên çar parçeyên Kurdistanê li salona Hotela Cotyar a bajarê Dihokê civînek hat li dar xistin.
Di civînê de nunerên HDP`ê, nûnerê PYD'ê yê Başûrê Kurdistan, rewşenbîrên ji Rojhilatê Kurdistanê, nûnerên KNK'ê, endamên rexistinên civaka sivîl û endamên partiyan amade bun.

### BÊ YEKÎTÎ SERKETIN NABE

Destpêka civînê nûnera HDP'ê ya Başûrê Kurdistanê Mûzeyen Guneş axivî û bal kişand ser yekîtiya netewî û got: "Di roja îro de ku şerê cîhanê yê sêyemîn tê kirin, eger Kurd yekîtiya xwe ava nekin wê ziyaneke mezin bibînin. Eger yekîtiya Kurd pêk neyê wê Kurd di sedsala 21'an de carekî din winda bikin."
Guneş diyar kir ku divê di zûtirîn dem de Kongreya Neteweyî were lidarxistin.

### DIVÊ KURD LI DIJÎ ÊRÎŞAN BIBIN YEK

Di civînê de nûnerên her çar parçeyên Kurdistanê jî axivîn û bal kişandin ser êrîşên rejîma Îranê ya li ser baregehên Hîzbî Demokratî Kurdistan-Îran û Hîzbî Demokratî Kurdistan û ev tişt hate gotin:
"Ev êrîş carekî din dide diyarkirin dijminên Kurdan ferqê naxe nava Kurdan û êrîşî destkeftiyên hemû Kurdan dike. Ji bo vê jî divê Kurd vê rastiyê bibîne û ev êrîş li ser me ferz dike ku rêxistinekî hevbeş û siyasetekî hevbeş a Kurdan pêk bînin.
Beşdarvanan jî rexneyên tund li Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK) kir ku astengiya ji bo kongreya neteweyî çêdike. Beşdarvanan anî ziman ku divê di demek zû de PDK dawî li van kiryarên xwe bîne û tevlî kongreya neteweyî bibe…
***ANF***



## Yekîtî dîsa yekitî!

Tayîp TEMEL

HDP di demeke gelek krîtîk de bi armanca sazûmankirina yekitiya neteweyî û xurtkirina têkiliyên bi hêzên Kurdistanî re dest bi hevdîtinên girîng kir. Xuya ye ku ev gav dê li Bakur gelek encamên nû bi xwe re bînin.
Tê zanîn ku gelê kurd û Kurdistan di demeke gelek nazîk û krîtîk re derbas dibin. Dora gelê kurd bi êrişkarên hov hatiye dorpêçkirin. Destkeftiyên hemû parçeyên Kurdistanê di bin êrîş û seferên giran ên neyaran de ne.
Belkî tu dem û dewranên dîrokê , Kurdistan ev qas nêzî derfetên serkeftinê nebûye û her wiha ji hemû parçeyan ve rastî êrîşeke ev qas berfireh û piralî nehatiye.
Li Başûr piştî referandûma Kerkûkê me dît ci hatiye kirin.
Jixwe êrîşên mezin li ser Rojava pêk anîn û ew peywira xwe niha dewrî çeteyên nêzî Tirkiyeyê kirine. Li Rojhilatê Kurdistanê Rejîma Paşverû ya Tehranê destûrê nade ku bi kurdayetiya azad pel jî bilive.
Êrîşên herî mezin jî li bakurê Kurdistanê tên meşandin. Bajar hatin tunekirin, li hemberî çiya û baniyan jî şer hatiye îlankirin. Îradeya kurdan ji hemû mekanîzmayên dewletê tê avêtin. Hemû sazî û dezgehên kurdan bi girtinê re rûbirû ne.
Bêguman di demeke wiha nazik de hewla HDP'ê ya yekitiyê hêjayê pesindayînê ye. Hevdîtina bi partiyên Kurdistanê re û peyamên ku piştî hevdîtinê hêvî dide.
Ji peyaman jî diyar dibe siyaseta kurd êdî gihiştiye wê merheleyê ku ji bo berjewendiya hemû civaka Kurdistanî, amade ye ku dev ji berjewendiyên xwe yên biçûk û erzan berde.
Jixwe ev 40 sal in ku Tevgera Kurdistanî ya li bakur doza yekitî û konferansa neteweyî dike. Lê wekî tê zanîn ku her carê ev daxwaz bi dîwarên ku dagirkerên Kurdistanê lêkirîne ket û paş ve vegeriya.
Yek ji hêza ku ji yekitiya gelê kurd aciz û nerazî jî her tim siyaseta dewleta tirk e. Tirkiyeyê ji ber ku dev ji siyaseta înkarê ya gelê kurd bernedaye, hem li dijî yekitiya gelê kurd e, hem jî li hemberî hemû destkeftiyên kurd û Kurdistanî ye.
Siyaseta kurd di mijara yekitiyê de li ser rêya rast e.
Êdî dem hatiye ku xewn xeyalên desthilatdaran ji ser siyaseta kurd rabin û hemû sazî û dezgehên xwedî hêz ji bo yekitî û çareseriyê bixebitin. Fêlbaziya dîrokê û rûreşiya xiyanetê divê bêyî ku ji gorê rabe, bê binaxkirin. Dema dema bilindkirina rûmetê ye.

## Rayedarên Partiya Pêşerojê ya Sûriyê bi welatiyên Efrînê re civiyan



Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya Buroya Efrînê ji bo danasîna armancên partiyê panelek li dar xist. Bi dehan welatî beşdarî panelê bûn. Di panelê de hate gotin, pêwîste gelê Sûriyê bi xwe çarenûsa xwe diyar bike.
Panel, bi dirûşmeya "Rola partiyê di pêşxistina felsefeya civakî û danûstandinan de"li kampa Serdemê ya Şehbayê hate lidarxistin. Bi dehan şêniyên Efrînê, tevî endamên sazî û meclisan beşdarî panelê bûn.
Serokê Partiya Pêşerojê yê Sûriyê ya Buroya Efrînê Mihemed Nûr rêgez û armancên partiyê destnîşan kir û diyar kir, armacna Partiya Pêşerojê çareserkirina aloziya Sûriyê bi riya siyasî ye.
Mihemed Nûr, di berdewama axaftina xwe de, anî ziman ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê di demeke ku hewcedariya gel bi mîna vê partiyê hebû, hate damezirandin û got, "partî nûnertiya hemû pêkhateyên Sûriyê dike."
Endamê Buroya Rêvebera ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya şaxê Efrînê Mihemed Beyrem jî li ser armancên partiyê wiha axivî: "Armanca sereke ya partiyê parastina pirrengiya civakî û pêkhateyên wê ye."
Di panelê de, Rêvebera Buroya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya Efrînê Bêrîvan Cinêd jî destnîşan kir ku partî ji bo pêşxistina rola jin di civakê de û pêkanîna wekheviya di navbera her du zayendan de dixebite. Bêrîvan anî ziman ku jin bingeha azadiya civakê ye…***ANHA***

## Partiyên siyasî yên Kurd li Amedê li hev rûniştin



Rayedarên HDP'ê û rayedarên partiyên siyasî yên Kurd li Amedê 4 saetan li hev rûniştin.
Piştî komxebata Rêveberiyên Xwecih a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) destpêka hilbijartinê hate kirin. Piştî komxebatê li ser vexwendina Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî bi partiyên Kurd re dema xwarinê hatin cem hev.
Rayedarên Herekata Azadî, PDK-T, OSP, Azadî, PDK-P, Partiya Îslamê û Hevserokên HDP'ê Pervîn Bûldan, Siyasetmedarê Kurd Ahmed Turk, Sirri Sakik, Wekîlên HDP'ê Îmam Taşçier, Necdet Îpekyuz û Tayyîp Temel, li Demîr Otel a Amedê li ser geşedanên dawî 4 saetan li hev rûniştin.
Hate gotin li ser hilbijartinên xwecih gotebêjî hatine kirin û li ser helwesta hevpar a li dijî gefên Erdogan ên 'em ê qeyûman bînin' hatiye axaftin. Agahî hate standin ku piştî danûstandinan û gotebêjiyê partî wê piştî bi heftiyekê bi rojeva 'hilbijartinên xwecih' dîsa li hev rûnin.

## Em Sûriyeke demokratîk û pirrengî dixwazin



Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Îbrahîm Qeftan diyar kir ku Rûsya û Rêjîma Sûriyê dizanin ku çarenûsa terorîstên li Îdlibê di destê Tirkiyê de ye, lewre peymana pê re mohr dikin.
Partiya Pêşerojê ya Sûriyê bi navê 'Bi danûstandinan re em ê bi pêş bikevin' paneleke li Hola Ciwanan a bajarê Minbicê li dar xist.
Bi dehan endamên komîte û saziyên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarên wê, endamên Hevbendiya Niştimanî, Partiya Nûjen û Demokratîk, hejmarek şêxên êlan, beşdarî panelê bûn.
Di panelê de pêşketinên dawî yên li Sûriyê hatin nirxandin. Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Ibrahîm El-Qeftan di panelê de axivî û diyar kir ku dema xaka Sûriyê ji dagirkeriya Tirk were rizgarkirin wê danûstandin û çareseriya aloziya Sûriyê pêk were."
Têkildarî mijara destûra nû jî El-Qeftan wiha got: "Em destûrek nû dixwazin ne nûkirin. Em Sûriyeke ne navendî, demokratîk û pirrengî dixwazin."…***ANHA***



# QSD'ê nifşek ji fikrê paşverû rizgar kir

***Pîrozbahiyên yekemîn salvegera rizgarkirina Reqayê dewam dikin. Buroya MSD'ê ya Helebê bi boneya yekemîn salvegera rizgarkirina Reqayê li taxa Şêxmeqsûd bi beşdariya bi dehan welatî û endamên saziyan civînek lidarxist. Di civînê de qala girîngiya rizgarkirina bajêr hat kirin û hat gotin ku QSD'ê bi rizgarkirina Reqayê nifşek ji fikrên paşverû yên DAIŞ'ê rizgarkir.***



Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) ya buroya Helebê bi wesîleya salvegera yekemîn a rizgarkirina bajarê Reqayê civînek li Hola civînan a taxa Şêxmeqsûd li dar xist. Di civînê de hate gotin, QSD'ê li Reqayê nifşek ji fikrê paşverû yê DAIŞ'ê rizgar kir.
Berpirsên partî, meclis, sivîl, hêzên leşkerî û bi dehan welatiyên taxê tev li civînê bûn.
Di civînê de Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk a Buroya Helebê Fehîma Hemo axivî û bal kişand li ser rizgarkirina bajarê Reqayê.
Fehîma Hemo diyar kir ku Reqa bi salan di bin dagireriya komên çeteyan de ma, çeteyan bi navê islamê talankirin, kuştin û wêrankirin, recim dikir û serjêdikirin. Fehîma da zanîn, nêzîkatiyên çeteyan ji baweriya ola islamê dûr e.
Fehîma Hemo, destnîşan kir ku îradeya gelê Reqayê ya rizgarkirinê roleke mezin di xelasbûna ji DAIŞ'ê de lîst, welatî li derdora QSD'ê kom bûn û destek dane pêngava rizgarkirinê.
Ji fermandarên YPG'ê Zagros Efrîn jî axivî û anî ziman ku pêngava rizgarkirina bajarê Reqayê li ser bangewaziyên welatiyan pêk hat û anî ziman ku çeteyên DAIŞ'ê li Reqayê mîna kansêrekê bû û şervanan ew şikandin.
Zagros di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku li Reqayê bi sedan şehîd hatin dayîn û wiha dewam kir: "Em îro dibînin ku bajarê Reqayê nefesa azadiyê distine, bi navê YPG'ê em soz didin şehîdên xwe ku em xeyalên wan bi cih bînin û Efrînê jî dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê rizgar bikin."
Di civînê de, endama Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Merwa Qonîlî, rêveberê Hevbendiya Niştimaniya Demokratîk a Sûriyê Mihemed Derwîş û rêveberê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Elî Stêrvan axivîn.
Di axaftinan de, hate gotin ku QSD'ê zarokên Reqayê û nifşek ji fikrê paşverû yê DAIŞ'ê rizgar kir…***ANHA***

## Encamên hilbijartina başûr piştî 20 rojan hatin eşkerekirin



Encamên hilbijartina parlamenta herêmî ya Başûrê Kurdistanê ku 30'ê Îlonê hate kirin, ji aliyê Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind a Serbixwe ve hatin eşkerekirin.
Encamên hilbijartina parlamenta Başûrê Kurdistanê piştî 20 rojan hatin eşkerekirin. Encam diviyabû di nava 72 saetan de bihata eşkerekirin. Beriya niha encamên ne fermî hatibûn ragihandin û gelek partiyên siyasî li ber rabûbûn.
Encamên fermî yên ji aliyê Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind a Serbixwe ya Herêma Kurdistanê ve hate eşkerekirin wiha ne:
Rêjeyan dengan û hejmara parlamenterên partiyan:
PDK: 686 hezar û 70 deng, 45 parlamenter
YNK: 319 hezar û 912 deng, 21 parlamenter
Tevgera Goran: 186 hezar û 903 deng, 12 parlamenter
Tevgera Nişfê Nû: 127 hezar û 115 deng, 8 parlamenter
Komela Îslamî: 109 hezar û 494 deng, 7 parlamenter
Koalîsyona Reformê: 79 hezar û 434 deng, 5 parlamenter
Koalîsyona Serdem: 15 hezar û 581 deng, parlamenterek
Azadî: 8 hezar û 63 deng, parlamenterek
11 parlamenterên hindikahiyan:
Pêşvebirina Tirkmen: 2
Reforma Tirkmen: 1
Millet: 1
Eniya Tirkmen: 1
Koalîsyona Yekîtiya Neteweyî: 3
Rafideyin: 1
Ermen: 1
Suryanî, Meclîsa Gel a Keldanî: 1
Komîsyonê ragihand, serokê lîsteya YNK'ê Kûbad Talabanî 182 hezar û 551, serokê lîsteya Tevgera Nifşê Nû Şaswar Abdulwahîd 106 hezar û 289, serokê lîsteya Tevgera Goran Alî Heme Salih 91 hezar û 934 deng stendine.

## Kiryarên dagirkeran li Efrînê sînoran nas nakin

Ji zêdetirî 7 mehan ve dewleta Tirk a dagirker kiryarên xwe li Efrînê yên wekî kuştin, revandin û qutkirina daran didomîne. Roj bi roj kiryarên xwe yên hovane û nemirovî zêde dike.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka dagirkirina Efrînê ve zêdetirî 2 hezar û 350 sivîl revandine. Çarenûsa 835 sivîlan ne diyar e. Di nava kesên hatine revandin de 139 jin hene. Dagirkeran zêdetirî 4 hezar û 500 darên zeytûnê desteser kirine.
Tê texmînkirin ku ji 7 mehan ve zêdetirî 9 hezar darên zeytûnê li seranserî kantona Efrînê hatine birrîn. Her wiha ji bilî wêrankirina cihên dîrokî, dizîna bermahiyên dîrokî û firotina wan, zêdetirî 5 hezar hektar daristan hatin şewitandin.
Hat ragihandin ku çeteyên artêşa Tirk li çiyayê Qaziqlî yê navçeya Cindirêsê û girê taxa Mehmûdiyê yê bajarê Efrînê bi dehan darên zeytûnê û daristan şewitandine.
Hat diyar kirin ku Goristana Şehîd Seydo ya li gundê Kefersefrê ya Cindirêsê di encama topbarana artêşa Tirk a dagirker de bi temamî hatiye wêrankirin.
Artêşa Tirk û çeteyên wê talankirina hilberîna zeytûnê berdewam dikin. Li gorî rayedarê Desteya Çandiniyê ya Kantona Efrînê da zanîn dagirkeran bi qasî ji sedî 90 ji hilberînê desteser kiriye.
Çeteyên El-Emşat beriya du rojan bi ser malên şêniyan de girt û welatiyê bi navê Semîr Mieratê ji gundê Kaxrê yê navçeya Mabatayê revand.
Ji aliyekî din ve artêşa Tirk bi zanabûn navên dibistan û kolanên kantona Efrînê diguherîne. Her wiha artêşa Tirk wêneyên Erdogan û ala Tirkiyê di têketina navçeya Şiyê de û kolanên sereke û şaxî de daliqandine, ev yek jî bi armanca guhertina demografiya herêmê pêk tînin…
***ANHA***





## Diplomasiya Kurd a dîsa-dîsa

Burhan ERDEM

Di van rojan de pêngavek di rojevê de ye ku derxistina navê PKKê ya ji lîsteya rêxistinên terrorist armanc dike. Bi dehan caran hewldanên vê yekê hatin rojevê lê belê bêencam bi dawî bûn. Eger mirov bixwaze dikare vê têkçûnê bi aliyê hember ve girêbide. Mirov dikane gelek sedeman peyda bike. Mirov dikane siyaseta dijminane ya li cîhanê sûcdar bike. Mirov dikane cotstandartiyê vebêje û hwd. Lê serneketftin an jî têkçûn ji tunebûna berdewamiya helwestê ye. Bi gotineke din pirsgirêk ji me ye û li malame ye.
Eger mirov hinekî helwesta tevgera azadiyê ya ji bo Almanyayê bîne bîra xwe, bi hêsanî dibîne ku rêveberên hingê xeletiyên mezin kirine. Di bin navê şoreşgeriya milîtanî de bi çalakiyên bêmane derdora xwe krîmînalîze kirine. Ji ber van çewtiyan jî Rêberê Kurdan ji gelê Almanyayê lêborîn daxwaz kiriye. Lê belê ji `93yan ve ye careke din tevgera azadiyê li Almanyayê bi ser xwe ve nehatiye û ji ew îmkanên mezin ên li vî welatî mahrûm maye. Hersal hinekî din faaliyetên kurdan ên li vêderê tên astengkirin. Gava ku mirov li sedemê dipirse jî, li cem ew kesên bûne sedema vê çewtsiyasetê gotin amade ye. Bi gotina `heval wisa nine` dest bi axftina xwe dikin û têkeliyên aborî yên aliyan û berjewendiyên welatan vedibêjin.
Berjewendiyên welatan wê hertim hebin. Lê dozeke meşrû ya mirov hebe, ev berjewendî li wijdanan namîne. Me mînaka vê yekê li Belçîkayê dît. Di sala 2006an de derbarê 36 kesan de dozek hatibû vekirin. Siyasetmedarên naskirî yên weke Remzî Kartal, Zubeyîr Aydar û Adem Uzun jî di nava vana de bûn. Piştî 11 salan ev doz bi biryara faaliyetên PKKê ne terorîzm e, bi encam bûbû. Dewleta Tirk ji ber vê biryarê har bûbû. Lewra tesîra wê ya li siyaseta adetî ya Tirkiyeyê gelekî zêde bû. Hemû tezên Tirkiyeyê têk çûbûn. Li ser vê rabûn îtiraz kirin û dozek din vebû. A di sale, di 2017an de Dadgeha Belçîkî got ew li ser biryara xwe ye û ji hemû Ewrûpayê re got PKK ne terrorist e!
Ev lîste di sala 2000`î de bi pêşengiya Îngilîstanê destpêkiribû û bingeha xwe ji ya DYA`yê werdigirt. Kurd û dostên Kurdan li dijî vê yekê derketin. Li hemberî vê biryarê riya dadgehê hebû û dostên kurdan rê bi ber dplomasiya kurd xistibûn. Lê Îngilîzan ji wan re gotibû hebûna navê PKK`ê sembolîk e lewra wê faaliyetên wê neyên astengkirin û kurd ji riya dadgehê vegeriyabûn. Lê roja ku îtiraza kurdan a ji vê yekê re qediyabû, dest bi astengkirina hemû kurdan kirbûn, heta avêtibûn ser komeleya herî naskirî Mala Gel jî.
Ji sala 2014 an ve ye, li ser nave endamên tevgera azadiyê, dozeke li dijî Yekitiya Ewrûpayê hatiye vekirin heye. Cihê vê doze Dadgeha Dîwana Adaletê ya Ewrûpayê ye. Di vê dozê de daxwaza kurdan ew e ku navê PKKê ji lîsteya rêxistinên terrorist a YEyê were derxistin. Ev lîste ji her 6 mehan carekê tê nûkirin. Derbarê rêxistina Tamîliyan de biryareke bi vî rengî weke emsal heye. Divê dîsa-dîsa dîplomasiya Kurd li ser vê dozê raweste. Wê ev yek riya serkeftineke mezin vebike.